

COVID-19

Nimûneya wergirtî ji rêkên bêhnkişandina te nîşan dide ku tu tûşî Vîrûsa Koronaya Nû ya bi navê KOVÎD-19'ê bûyî.

Nîşaneyên KOVÎD-19'ê

Nîşaneyên nasyar Ta, Êşa gewriyê, serêş, Êşa Masûlkeyan, Kuxîn û Astengiya Bêhnkişandinê ne



Derman

Heke nîşaneyên nizim ên Vîrûsa KOVÎD-19'ê hebin

Heke rewşa te zêde xedar nebe û hewce nebe ku li nexweşxaneyê werî razandin, tu yê bo mala xwe werî şandin. Destûrkarên ku di bin beşa "Piştî vegeyriyana bo malê" da hatine, bişopîne.

Dema ku tu li nexweşxaneyê bî, emê binirxînin ku gelo ceribandîna zêdetir pêwîst dike an na

Dema ku tu li nexweşxaneyê bî, em dikarin dermanên alîkar ên wek Oksîjen û Antî-Biyotîkan jibo te dabîn bikin.

Heta niha hîç dermanek jibo vê vîrûsê bixwe tune.

Di babetên kêmdîtî da renga jibo dermankirinê hewcetî bi Amûra Bêhndayînê (ventilator treatment) hebe.

Dema ku tu li nexweşxaneyê bî, tu yê di rewşa Dabirrîn û Qerentîneyê da bimînî.

Mafê tu kesî dê tunebe ku te bibîne û nêzikî te bibe.

Hûn nikarin xelat, gul û hwd. ji kesên nêzikî xwe wergirin.

Dermankirina we ya asayî

Wekî rêzik, hûn ê dermanên xwe yê rêkûpêk ji berpirsan wergirin.

Eger hûn dermanên taybet dixwin, bi berpirsan re biaxivin.



Di rojên bê da

Heke rewşa te xerabtir bû, digel bijîşkê xwe an xizmetên Bijîşkiya Awarte da bikeve têkiliyê

Wek mînak, heke singê te diêşe, dîsa taya te heye an heke bêhnkişandina te zêdetir asteng bûye.



Lêzanîna zêdetir

Lêzanînên zêdetir li ser Vîrûsa KOVÎD-19'ê

Rêveberiya Tendurustiyê ya Danîmarkê, berdewam malpera xwe biroj dike (www.sst.dk).

Her wiha tu dikarî bi riya hejmara telefona '+45 7841 4840' digel Hêla taybet a Vîrûsa Koronaya Nû bikevî têkilliyê.

Li malpera www.sst.dk/en/English/Corona-eng/Further-information/Publications-in-other-languages, lêzanînên têkildarî KOVÎD-19'ê bi çend zimnanan li ber dest in.